HAWARA TAZE

Ramyarî Rewşenbîrî Gişiye

Kombenda Kawa Bo Çanda Kurdî Derdixe

Çavdêrê Giştî
Selah Bedredîn

Desteka nivîseran
Dr. Birahîm Mehmûd
Dr. mihemed Ezîz Zaza
Ebdilxaliq Sersam
Aryan Birahîm
Vedan Adem
Ferde Cemîl Paşa

Derhênana Qap
Mihemed Qadir

Derhênana Hunerî
Îsam Hecî Tahir

Naverok

71	*Selah Bedredîn*	Helgira Morên Xweyîbûn
70	*Sedat YURTDAŞ*	Wêje jiyan e…
68	*Vedan Adem*	Li Dihoka Azad Navê ..
66	*Dr. Birahîm Mehmûd*	Rola Hawar
63	*Vedan Adem*	NÛXWAZIYA SIYASÎ BI NÊRÎNEKE KURDÎ

Hewlêr - Şoreş - Cada Selahedîn Tel. 2240441 - 2242843

binkeykawa@hevgirtin.net www.hevgirtin.net

Helgira Morên Xwîbûn
JINEK BERZ Û BI RÛMET

Nazime Cemîl Paşa bermahiya tûxmekî welatparêzî navdare di malbatekî xebatgerde

perwerde bûye apê wê Qedrî Cemêl Paşa yekjiwanbû û biwanre derdên xerîbiyê derbaskiriye piştî penaberiya bidarê zorê û dûrkirin jimal û senteneta bav û kalan ewê gelek serpêhatiyên tal biçavêserêxwe dîtin herweha di zaroktiya xwede xebata – xwîbûn – jibîrnake jibo doza Kûrdistan û mafên carenûs

Nazimexan malû milkê malbatê li Amed kû rijêmê Atatûrk destdanîser jibêrkiribû herweha gûnd û erdê malbatê li binxetêji kû rijêmê Beis destdanîser gelek libalawê nebû lê tistekîdinî giranbiha jibîrawê neçû ewjî Morên – Xweyîbûn – bûn biryarawê ewbû kû wan biparêze û bi dehên salan hilgire û veşêre heyanî nekeve destên (Jendirma û Mebahis û Mekteb tanî û Derek û hemî hêzên Ewlekariyê) li Sûriyê

Parastina – Moran – bixwe divan hemî salande lijêr sîbera rijêmên şofînî û neyar bixwe karekî hesan nîne dikarê bibe wek romanek yanjî wek destanekî dagirtî ji rûmet û jinxasî û welatparêzî Nazime bivîkarî navêxwe xiste Lîsta Qehremanên Gelême ewjî jêre pîrozbe herweha divê em rola keça malbatê – Ferde Cemîl Paşa – jibîrnekin kû dabû ser riya pirs û geran û bidestxistina Moran sipas û aferîn ji bo Ferdexan

Selah Bedredin

Wêje jiyan e...

Sedat YURTDAŞ
(Serokê Komeleya Nivîskarên Kurd)

Dûwemîn Rojên Wêjeyî yê Amedê, bi dirûşmeya sernivîs ê di navbera 30 Mijdar/Sermawez/Çiriya paşin -05 Berfanbar/Kanûn 2004'an destpêkir û bidawî bû.

Belê, ji bo ez bala xwendevên bikşînim ser pirsgirêken me yê navên mehan, min hersê navên ku têne bikar anîn bi hev re nivisîn.

Di heman demê de, di 2-3 Berfanbarê de jî Konferansa Zimanê Kurdî lidarket. Rojên Wêjeyê ji herkesî re vekirî bû, lê "Konferans" bi tenê bi beşdarbûyîna şandeyan ve lidarket.

Di dawîya Konferansê, bi tevlî destnîşanên beşdaran ve daxûyanîyek jî li çapemenîyê hate belav kirin. Di daxûyanî de; li ser kevnare bûyîna zimanê Kurdî hate sekinîn. Dabeşkirina zaravayan ji zanyarên Kurdî re hate hiştin. Hînkirina zimên ya ji bo zarokan hate pêşnîyar kirin. Ji zimanî Kurdî re azadî û wekhevî hate xwestin û heman demê de banga fermî bûyîna zimanê dûwemîn; azadbûyîna weşana radyo û televîzyonan û xwestina zimanê perwerdehîyê hate aşkere kirin. Ji sazî û rêxistinan jî fermî kirina zimên hate xwestin. Ji bo pêşketina zimanê Kurdî jî pêdivîya aşitî û aramîyê careke din hate destnîşan kirin.

Bi rastî jî, Konferansa zimanê Kurdî, mîna gelek mêvanên birêz, di axaftinên xwe de anîbûn ser zimên, lidarketin a wê ya li "dilê welêt" tişteke gelek xweş, hêja, serkeftî û hêvîbar bû. Ji bo me gelekan mîna xewnekê bû. Xewnek dûwemîn. Xewna ku me teva bi hevre (di)jîya.

Ez hêvî dikim, -mîna ku beşdarên Konferansê peywirek da ser heft kesên nûnerên bijartî- ew ê ji bo salek din peywendî yên xwe bi hemû kes û sazîyên pisporên zimên re daynin û di Konferansên pêşin de wê pirsgirêkên heyî, bi qasî ku zanyarî ya zimên û îradeya beşdaran dest dide wê ji bo çareserkirana wan pê_nîyarên di cih de di salên pêşte karibe bike bike biryar. Birayarên bi cih hatî!

"Di bername ya Rojên Wêjeyî de yê de, ji hemû ziman û çandên Rojhelata Navîn û ji Kafkaskayê û ji gelek deverên dinê, zimanzan, kurdolog, dîroknas, wêjenas, romannûs, çîroknûs û helbestvan hatibûn.

Ji Zankoya Wîyana yê Prof Celilê Celîl, jî Moskowa'yê Azîzê Cewo Memoyan, ji Enstîtuya S.Petersburg ê Prof Dr. Zera Ûsif, Prof Dr Ordîxanê Celîl,

Prof. Dr Îraîda Anatolîevna Smîrnova, ji Parîsê Prof. Dr. Joyce Blau û Rafî Kebapciyan, Ji Swêdê Prof. Dr Karîna Cîhanî, Firat Cewerî, Malmîsanij, ji Kanada yê Prof. Dr. Amir Hasanpour, Ji Holandê Prof. Martin Van Bruinessen, Ji Îranê Dr. Elî Roxzadî; Ji Başûrê Kurdistanê Prof Dr Mistefa Resûl, ji Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê şefîk Beyaz, ji Navenda Pan a Kurd Mistefa Re_îd, Yunis Behram û Sitêya Hêvî Berwarî û ji Tirkîyê jî; Serokê Wêjenasên Tirkîyê Gökhan Cengizhan, Ji Rêvebirên Pen a Tirkîyê Halil şbrahim Özcan, Haydar Ergülen, Migirdiç Margosyan. Gelek kesên bi esil û bi helwesta xwe ve Kurd lê bi zimanê xwe ve wêjenasên Tirkî, helbestvanên mîna Yılmaz Odabaşı, Muzaffer Kale, Adnan Satıcı, Kemal Varol, Hicri şzgören; Ji Sûrî Lokman Dêrikî şew jî mîna me yê jorin bi gotina Munzer Masrî xwedîyê du dêyan zimanê Kurdî û Erebî bû- Ferec Bayraktar, ji Yekîtîya Nivîskarên Duhok ê Dr.Arif Hîto, Ismet Muhemmed Bedel, Ebdulwehab Xalid, Hesen Hecî Cemanî, ji Silêmanîyê Cewher Kurmanc û Ebubekir Xoşnav, ji Kurdistana Îranê şemzdîn û şerko Cîhanî; Ji me û zimanê xwe jî Rênas Jîyan, Kawa Nemir, Serkeft Botan, Dilawer Zeraq, Sîdar Jîr û Lal Laleş û li gelek kesên dinên hêja beşdar bûn.

Belê, belê… Di pêy gelek salên dirêj, salên şer, salên tirs û mirinê xof û talanan şûnde, ev çalakî ji bo bajêr, ji bo gelê bajêr û ji bo herêmê mîna bêhn girtineke bi aramî bû. Bawer dikim wê bandora xwe hîn gelek wextên dirêj nîşan bide. Wê ew çalakî bibe sedema zêdebûyîna gelek nivîshezan; bibe sebebê nivisandina gelek riste, çîrok û vegotinan. Bajar vê carê dengê xwe yê dîrokî, dengê xwe yê însanî, bi helbestan, bi çîrokan, bi romanan, bi vegotinan; bi hûnerî bilind kir û nasnameya xwe ya çandî careke din bi xurtî li dost û ne dostan da nîşan.

Dengên ku, li çar alî Amedê ji gelek ziman û çandan bilind bûn, li dora Bedenên Amedê tevlî dengên wendayî, tevlî dengên veşartî, tevlî dengên jibîrbûyî, tevlî dengên nû hildayî ve mîna koroyek pirdeng-pirreng ji nû ve vejîya.

Di heman demê de, me bi wêjenasên ji Tirkîyê hatibûn, bi wan re têkilîyên gelek bi ast, xweş û germ danîn. Ji ber vê yekê 2005 hevî dikim wê bibe heyfgirtina sed salê li me bi neheqwî buhurî. Li gor gotina wan, wê di navbera 2005an de di çalakî yên xwe yê li rojavayê Tirkîyê de, me jî, hevalên me yê helbestvan, çîroknûs, romannûs, nivîskar û rojnamevan vexwînin bo ku bi zimanê xwe ve beşdar bibin.

Beyî xwe, zimanê xwe, reng û şêweya xwe vegûherînin wê xwe bigihînin girse yan, wê xwe bighînin wêjehezan.

Aşkereye ku wêjeya Kurdî ya Bakur, mîna pêleke ji bin erdê ve hêdî hêdî tê hiltê; xwe dide der. Bivê-nevê wê biherike. Wê cihê xwe yê bi rûmet, di nava çand û huner a dinê de zû-dereng bigire.

19 Berfanbar 2004 syurtdas@yahoo.com

Li Dihoka Azad Navê Bedirxaniyan Bilind dibe

Vedan Adem

Mala Barzan ya ku navê wê di ferehtirîn dergeh de derbasî dîroka gelê kurd û kurdistanê, nexasime ji dawiya çerxê nozdê û heya evro berdewam maye di qada xebat û têkoşîna gelê kurdistanê ji bi destveanîna mafên rewa û çarenivîsê gelê kurd û herdem bûye pêşeng û serkêşê vê xebatê û Piştî rizgarkirina bitiriya qad û gelê herêma kurdistana Îraqê,wek wefadarî û rêzgirtin bo wan binemal û kesên jiyana xwe terxankirbûn di rêka têkoşîn û xebatê bo azadiya gelê kurdistanê, ku eve jî yeke ji resentirîn dab û nerîtên gelê kurde û ya zor zelale di vê binemalê de (binemala Barzan), lewma û li gor şîret rênmayên serok Mesûd Barzanî hukmeta herêma kurdistanê dest bi cihanîna pirojê rêzgirtina binemala Bedixan Paşa, ku ev binemal bi tevaya endamên xweve rolekî berçav û mezin di xebata siysî û rewşenbîrî ya gelê kurdistanê de heye, lewma û di roja bîrhatina sedsaliya rojnamevaniya kurdî de (22 -4 - 1998), ku berî sedsalan ji vê rojê ve yekemîn rojnama kurdî (Rojnama Kurdistan) li paytextê welatê Misrê, Qahîrê, bi dest û zendên hêja Miqdad Bedirxan Paşa derketibû, li vê rojê berê binyatê pirojê avakirina pertûkxaneke mezin û hevçerx binavê Pertûkxana Bedirxaniya li bajarê Dihokê hate danan bidestê xanim (Sînem Xan)ê ve, ku neviya Bedirxan Paşa yê mezine.

Avahiyê Pertûkxanê bi destê rêzdar Nêçîrvan Barzanî ve hate vekirin bi amadebûna Sînem Xan û hijmareke zora mezin ji rewşenbîr û berpirsên partî û hukmetê ve .

Îro pertûkxana Bedirxaniya li bajarê Dihokê navê vê binemalê bilind hembêz dikê û mifayekî mezin li jêr sîbera vî navî pêşkêşî xelkê kurdistanê dikê.

Pertûkxane jî ji sê qata û van pişkan pêk tê :

1 - PişkaMûzîqê : dih kes bihevre

karin guhê xwe bidin stiran û mûzqê, her kes li dûv daxwaza xwe.

2 - Hola Enfalan : pêktê ji hijmareke mezina kursîkan, televizyonek mezin, hijmareke mezin ji dikyomentên li dor kiryarê Enfalan, yên ku dijminê gelê kurdistanê bi serê xelkê tena û sivîl yên kurdistanê anye, her wesa jî hijmareke mezin ji wêneyên şehîdên Enfalan.

3 - Pişka Kovar û Rojnaman: ev pişk bêtiriya kovar û rojnamên li Kurdistanê û Îraqê û hidekên deverê bi xweve digrê, zêdebarî erşîvekî zengîn di vî warî de.

4 - Pişka Bergvaniyê: li vê pişkê karmendên Pertûkxanê bi kiryara bergkirina Pertûkan bi şêweyekî ciwan û qeşeng .

5 -Hola Zarokan: li vê pişkê cihekî taybet ji bo zarokan hatiye dirust kirin û hijmareke zor ji Pertûk, Kovar, wêne, reng û Pênûs li berdestê zarokane, her wesa jî mamosta hene ji bo çîrok gotinê û rojane nêzîkî (200 - 250) zarok dibin mihvanê vê pişkê.

6 -Pertûkxane: ev pişk jî bi hezarên Pertûkan, yên heme cor hembêz dikê bo rewşenbîr û xwendevanan.

7 -Hola xwendinê: 60 mihvanê Pertûkxana Bedirxaniya karin li vê pişkê bixwênin û li bere holeke dîtir bê girêdan li gel vê pişkê da ku têra mihvanên Pertûkxanê bikê nexasime şagirdên Zanîngehê.

8 -Kafîtirya: ev pişk hatiye dirust kirin ji bo bihinvedan û xwarin û vexwarinên sivk ji mihvanên Pertûkxanê, çimkî Pertûkxane ya vekirî ye ji demjimêr Heştê sipêdê heya şeşê êvarê.

Her wesa Pertûkxanê baxçeyekî berfireh û şanoyek ji bo gêrana kor û simînaran.

Rola Hawar

Dr birahîm Mehmûd

Bi derketina Kovara Hawar a nû em pêwîst dibînin, di gotarekê de (her çend bi kurtî be jî)

giringî û rola HAWAR a Mîr Celadet Bedirxan, ku di destpêka salên 30 ê de li sedsala buhirî de derdiket, diyar bikin

Bêgoman, heger mirov li ser kovara HAWAR ê bi axive û lê bikole, nabê mirov, xwediyê wê, herçend bi kurtî be jî, nede nasîn; Mîr C.Alî Bedirxan yek ji neviyên Mîrê Cizîra Botan (Rola vê Malbatê û Mîrniînê di dîroka Kurdistanê de pir dirêj û giring bû, emê hewil bidin di hejmarên dahatû de li ser rawestin û şirove bikin) ê herî çalak bû; ew di dîroka me de wek Nivîskar, zimanzan û Rojnamevanekî leheng û jêhatî tê naskirin ê. Lê rola wî a herî mezin û keda wî a ku tucarî nayê jibîr kirinê, di warê ziman de bû. Hêjayî gotinê ye, ku C. Bedirxan jibilî zimanê zikmakî ê dayikê, bi çend zimanên din jî dizanî, mîna Tirkî,Erebî, Ferensî,Inglîzî, Yûnanî, Farisî û Elemanî. Wî bi berpirsiyriyeke neteweyî bilind, hemû zanebûn û ezmûna xwe xistbû xizmeta ziman û çanda kurdî; ew bû damezirvanê tîpên Latînî di zimanê me de, her weha wî bi şêweyekî zanistî bingeha rêzimanî ji me re danî. Lewra em dikarin bêjin, ku HAWAR ji wî re bû meydana derxistina berhemên xwe û ezmûna yekemîn ji bo pişteWanî û îsbatkirina ramana xwe a sereke:“ Yekîtiya Neteweyî ji yekîtiya ziman destpêdike; û yekîtiya ziman ji yekîtiya herfan (pîtan) destpêdike

Li dayikbûna HAWAR ê:

Wek tê zanîn Celadet Bedirxan hîn di xortaniya xwe de, bîra giringiya zimanê nivîskî û yekgirtû ji bo doza serxwebûn û azadiya Kurdistan dibir; gera wî li Europa, nasîna ziman, kultur û çandên cuda cuda, nemaze piştî xwendina li Elemaniya, ev bîr û bawer li ba wî xwirtir bû û bich anîna wan jê re bû armance yekemîn; û li hêviya keyslêhatin û firsendê mabû; ew firsend li paytexta Sûriyê, şamê di dema hukmê Ferensiyan de bi dest ketibû!!HAWAR bû rêyalîtêt û hejmara yekemîn di 15 ê Gulana 1932 an

de hate weşan; bi weşana Kovara HAWAR ê rûpeleke nû di dîroka rojnamegeriya kurdî de hate vekirinê û gaveke pir giring û mêrane di dîroka peyva kurdî a nivîskî de hate avêtin; yekem car bû, ku weşaneke kurdî bi herdû tîpên latînî û erebî tê belavkirin ê; herweha yekem car bû ku hewildaneke ceddî ji bo nêzîkbûna herdû zaravên sereke di zimanê kurdî de, hate kirin

Di hejmara pêşîn de, sernivîsarê HAWAR ê armanc, şêweyî xebat û nivisandina wê eşkira kiribû; emê bi kurtî wan di van xalên jêrîn de bênin ser kaxezê:

1- Cî bi cîkirina Alêfbaya Latînî di zimanê kurdî de, û belavkirina wê di nav kurdan de.

2- Lêkolîn li ser dîroka zimanê kurdî, berhevkirin û belavkirina belgenameyên zimanzanî >û xebat ji bo nêzîkkirina herdû zaravên kurdî ên sereke.

3- Komkirin û belavkirina berhemên edebiyata kurdî a devkî û parastina wan ji wendakirinê. 4- Danehev, rêkxistina û belavkirina berhemên kilasîkên kurd; û nasandina Hozanvanên navdar ên gelê kurd bi xwendevanan.

5- Nasandina kurdan bi erdnîgariya (Cografiya) welatê wan û samanên (dewlemendiya) wê. 6- Diyarkirina rola zanist û zanebûnê di pêşvebirina civakê de.

Bêgoman heger mirov bi hûrî li ser hemû hejmarên HAWAR ê (bi giştî 57 hejmar der çûn, a herî dawî di 15 ê tîrmeha sala 1943 an de derketibû; ji wan 23 ê hejmarên pêşî bi herdû alêfbayan bûn, ji wê bi şûn ve xwirû bi tîpên latînî bû) raweste, wê baş bibêne, ku Berpirsên wê armanc û ramanên xwe tanî radeyeke mezin li ser rûpelên weşanê bi ch anîbûn, nemaze di warê ziman de; ji ber piştî bi karanîna alyefbaya latînî, zaravê kurmanciya jorîn bi pêşve çû û berhemên nivîskarên mezin ketin ber destên xwendevanan. Isbata vê yekê: Piştê derçûna HAWAR ê bi salekê, di hejmara 20 an de sernivîsarek bi navnîşana „ Heybîneke Yeksalî „ hatiye weşan û tê de hatiye gotin: „ Belê, Hawar, ev zaroka yeksalî di jiyîna miletê me de, heyineke welê ye ko hîmê zmanê me daniye. Êdî zmanê me ne tenê zmanê axaftinê ye, bûye zmanê nivisandinê jî. Ji milê din, vê zaroka hanî ji me re ev herf anîne û pê nivisandina zimanê me gelekî hêsan bûye û her dengê zmanê me yek bi yek weke xwe, li ser kaxezê hate seknandin.

Digel belavkirin û fêrkirina alêfbayê de jî, C. Bedirxan û HAWAR bayex û cihekî mezin didane Rêzimana Kurmanciya jorîn (zaravê bakur); bi zanebûn û hostayetî hîmên giramer û qaîdeyên zimanê nivîskî cî bi cî kirin; em bê tirs dikarên bêjin, ku wan kevirên bingehîn ji bo avakirin û pêşvebirina Rêziman û rastnivîsa zaravê kurmanciya jorîn danî. Ji bilî pirsa Alêfbayê û rêziman, hawar cihekî fereh û guhdaneke bê hempa dida Edebiyata Kurdî û berhemên kilasîkên Kurdan bi giştî, ê kurmanciya Jor û jêr; nemaza di her 23 ê hejmarên

pêşîn de; bi sedan destan, çîrok, stran, helbest, serpêhatî, lêkolîn û nivîsarên bi nirx ên kilasîkên kurdan di hatina weşandin. Wek tê xwiyan Kovara HAWAR bû bû meydana berhevkirina berhemên cuda û bi zaravên Kurmancê ên sereke; herwise bû bû cihê gift û go û gengeşê di navbera zana, hişmend û nivîskarên wê serdemê de, li ser avakirina zimanekî nivîskî yekgirtû de, lê mixabin bi hoyê gelek pirsên siyasî, û aborî ev pirsa giring di jiyana gelê me de hîn jî ne hatiye çareserkirinê; Ji ber wê vêgavê pirseke giring tê meydanê: Gelo, ma lê ne hêjaye, ku em îro bi ceddî û çalakî li ser vê pirsa giring rawestin û ji nûve vejênin; nemaze di dema hazir de gelk şertên çareserkirina wê li ber destin, bi taybetî li başûrê Kurdistanê

Ez hêvîdarim, ku Hawar a nû di vî warî de bi rola xwe rabe xwendevan û pisporên me

NÛXWAZIYA SIYASÎ BI NÊRÎNEKE KURDÎ

Vedan Adem

Dergeh:

Di çarêka dewiya sedsaliya bûrî de, û bi awayek berçav di çarçûvê hevpeyvîn û gengeşan de, li dor guhorînên hizrî û binyatgerî yên bingehîn, li hemî terzên hevbendiyên civakî berfireh bûn, û li dor peyde bûna têgeh û hizrên nû, nemaze li deh salên dewiyê û mişebûna dijwariyê digel hatina cîhanê bo nav sedsaliyeka nû û hizar saliyeka nû û ew yeka digel de hatî ji berzbûn û mezin bûna rolê, cîhangêriyê bo bijandina van têgeh û zaravan, ji van têgehên nu yên gengeşên hizrî û siyasî bi awayek serekî û bi têr û teselî, li ser hatîne kirin têgeh yan zaravê nûkirin yan nûxwaziya siyasî. Wateya nûxwaziya siyasî çiye?

Bêguman û berî biçîne di nav vî babetî de pêtiviye amajê bi hindê bikin ku pirosêsa cuda kirinê di nav bera tiştê nû û yê kevin di siyasetê de her weku di her biyavekîdî de çi yê teknîkî yan felsefî bi pila ykê girêday helwystê mirovî ye ji pêvajoya hizrî û huşyariyê û çendeyetiya mifa wergirtinê û di dûvre bihaiyê berhemê ebistmolocî û matiryalê ew biyave pêşkêş di ke.

Ya xuyaye ku pirosêsa nûkirina siyasî di hemî biyavan de nemaze di siyasetê de bi awayek taybetî girêdayî pirnsîpa xweserya hizrî û serweriya wî ye, eve jî ji hindê di hêt ku aqil xwedenê berhemê ebistmolocî û matiryale û jê berpirse, û dema nûxwazî bi vî awaiy li aqilî dinerê wesa di bînê ku yê belav ker û ber fireh kere, giringî nadê her hêzeka ne ya lujîkî û piraktîkî ji ber hindê jî ku bizavê ji bo pêşve birin û bi aşkerane jiyanê li cîhanê di ket biriya pêkola kontirol kirina wê (an ku cîhanê) bi teknîkên xwe yên piraktîkî ve û her wesa kontirol kirina civakî bi riya rêkxistina xwe li ser binyatên lujîk û rêbazî yên zanistî û di pêngava xwe ya ykê û serekî de li gor nerîna nûxwaziyê aqil li ser binyatê hembêz kirina timama yasayên babetî yên cîhanî di hête avakirin û bi wî rengî van yasaya werdigirê ku pê berhev bê

da karî ji bo pêşvebirina wê bikê û derbirînê ji baweriya xwe dikê, ku heta bi gihê armancekê pêdiviye li riya vekolînên ji rast û kiriyarê bo jîwarî bi cî û dûpat bikê ku ne bi tenê cîhan di têgha xwe de karibê werarkirin û başkirin belku paşeroja wê jî bi vî rengî ew ber bi mandalkirin û ne hêlana hemû têgehên xerîzî û xweristî yên mirovî diçê ji bilî ewên girêdeyî bi azadiyê ve.

Anku me jî li gor têgehiştina nûxiwaziyê ji hindê re di rawestê ku serederî digel bê kirin weku gewher belku wesa sere derî pêre tê kirin weku amîrek xwedan şiyanên kontirol kirina alavên dî, ku bizavê ji bona peydakirina jiyaneka baştir û şadtir di ket da nûxwaziya siyasî xwe bi bînê rêkeke teknîkî ji bo xizmet kirina jiyana şad û azadiya kesokî di wergrtina hizr û bîran de û hemî têgehê xweristî yên mirovayetî mandal dikê ji bilî ewên girêday azadiya kesokî di rehindiya xwe ya komelî de bi taybetî. Ew berev vê çendê di çê bi riyaaqildarî ya pile dar û werar kirî ya cîhana civakî û mişt xane kirin li ser sîstemê dezgeh kirinê li civakî weku debîn kirinek bi ser bestyeka mezintir, ev jî wergeryaneke li ser têgehên felsefî û siyasiyên kevin û yên wê li dor hev goncandinê di nav bera siruştê kesî û siruştê sîstemê guhorîna deshelatderiyê bo teknîkê li gor dîtina nûxwaziyê an ku bo hijandina rolê felsefê di nav wê teknîkê de û ev yekeye ya (Cêms Bronham) di pertûka xwe de (çerxê rekxeran) piştî şerê cîhanî yê diwê dûpat kirî, ku bûye destpêka rast û aşkera ya hevrikiyê di navbera zanistê siyasî û felsefa siyasî(Bironham) hizir di kê ku serdemê nûke (mawê hevrikiyê û şerê sar) bi tenê qonaxeke veguhestinê ye di navbera du terzên civakan, û radigehênê ku sosiyalizim li dûv sermayedariyê nahê û civakê kargêrî dê li dûv sermayederiyê hêt. Berî bi dawî hatina vê nîv sedsalê, aborê nû dê di alozıya xwe ya hevdem de pêtivî bi destkeka kargêran hebê ji bo rêkxistin û çavdêriya karî û werara mirovatî jî ev yeke çespandî ye, xiwandina (Cêms bironham) jî rastgoya xwe wergirtî ye beramber xwandina markis ku bizava dawiyê bû di dîroka mirovanî ji bo vejandina felsefa siyasî û dirêjî pêden bû ji bo bizavên berê ji bizava Eflaton bo danana Komara nimûneyî ya xwe li(Seratosiya)li salên (427 B.Z. - 347 B.Z.) her wesa ne şiyana markisîzimê dûpatkirin ji bo bi cih înana suzên xwe û paşî jî keftina wê ya dewiyê di nav bera salên (1989 –1991) Z. û ji nav birina şiyanên hindê bo rabûna felsefa siyasî careka dî û bi çi rengekî ji alê çepê siyasî, her wesa ji alê rast girê siyasî jî ve bi egerê serkeftina aydiyolociya yên lebiral li gelek cihên cîhanê ku di dîtina xwe de bo civakî kes di kin pîverê yekane ji bo bandorên siyasî li ser, bi hindê jî rê li bizavên rastgiran digirê ji bo vejandina felsefa siyasî ji alê xwe ve, vê yekê jî boçûna hizirî ya mirovayetiyê çi rast çi çep palde hindê ku dest ji têgehên felsefî bo serbestiyê berdê û giringiyê bidê têgehên tedewilî û îcray yên azadiyê û eve ye ya daxwazkrên boçûnên berê di siyasetê derbirîn jê kirîne, destpêke ji Rîmon aron û Hena arindêt û heta Dubirê û Foko, di zincîreka kiriyarên li xwe zivirînê, anku her mirovekî serbestiyeka timam heye ji bo helbijartina hizrên xwe û avakirina baweriyê xwe li gor wî mifayê jê di hête wergirtin û bi wî rengê guncay digel û bi

mercekî ku helbijartinên wî hev dij nebin digel serbestî û helbijartinên kesên dî çi weku kes yan kom. Li pey vê yekê siyaseta nû ber bi hindê çû ku ne mînê felsefe yan ayiyolociye da bi bîte bi tenê teknîkek bo xizmet kirina azadiya kesokî di rehendê civakî de.

Anku bi gotinek hûr tir da bi bîte zanistekê dijîtal û bîrkarî (hijmarî) yê hîr li ser binyatê hizra zanistî li şûna hizra felsefî eve jî xaleka guhorînê ya giringe di karwanê pirosêsa werara hizra mirovî de bi awayekî giştî ne bi tenê ya siyasî, anku zanist cihên felsefa kilasîk dagîr kê û kontirol kê, li vêrê em di bînin ku pirosêsa nûkirina siyasî pêdvî bi pirosêsa nûkirina zanistî û teknulocya yê di hemî biyavên civakî de weku mercekê serekî giringiyeka zêde werdigirê di riya werar û pêşve çûna civakî de, her wesa wê hizrê ne kê ku şiyanên bi cih înana nûkirina siyasî weku pirosêseka werarê ya bê dawî li biyavê berçav pirosêseka sanahî û asane nemaze di biyavên bi cih înana wê de, li pey mercehiyeta wê ya rûj ava nemaze dest nîşan kirinên (Maks Fîper) ku pirosêseka veguhastinê ye ji xwe bestina destheltdariyê bi mercehiyeteka kilasîk li ser binyatê pîroziya demê borî û keleporî ber bi mercehiyeteka zanistî ya ferhengî.

Anku veguhastina wê ji şerhiyeta kilasîk ber bi şerhiyeta nû yan kar ber bi nûkirina şerhiyeta kilasîk nemaze di civakên kilasîk de. Eve jî armanceke û gelek asteng di kevine di rê de ji ber peywendiya wê ya kevin bi hemî guhorînên binyatgerî yên civakî (civakî - rewşenbîrî - siyasî - aborî) û li dor vê çendê nûxwaziya siyasî ku bizava nûkirina binyatê civakî yên siyasî dikê bi rengekî taybet ji ber ku ew çarçuvê giştî yê hemî binyatên dî yên civakî ye, pêtivî ye bo demekî dirêj hemî wan binyatên civak li ser dihête avakirin li berçav werbigirê. Eve digel wergirtina rastiya nûxwaziya siyasî ku ew encamê tevaya pirosêsên guhorînê û werara civakî ye li ser hemî astekî, û ew bizavê dikê ji bo nehêlana hemî boçûnên kevin li dor çewaniya peywendiyên di nav bera desthelatdariyê û kesî de li civakî. li vêrê nûxiwaziya civakî di bê fakterekî babetî û encamê lojîkî yê rast yê pirosêsên nûkirina berfireh. Bi riya dûvçûna dîrokî, û werara pirosêsa nûkirina siyasî li rojava dê gihine wî encamî ku zêdebarî ber sînggirtina wî bo boçûnên kilasîk belê biyavekî berfireh hebû bo hemî biniyt û hêzên kevin û yên nû û daxwaz kerên nûkirinê wî demî derbirîn ji vê hizirê kirin demê dexiwaza têgeha serxwebûnê di biyavê siyasî de kirîn ji hemî biyavên dî nexasime biyavê olî ew jî bi egerê wê hevbendiya bi hêz têkçûy û piraniya caran de di nav bera siyasetê û olî de ev hevbendiye jî pitir rûn bo di hevbendiya mîrî û papay de û dupat di kir ku dest helata dînî liser est helata siyasî bi awayekê êk rast yan ne êk rast ya xuya ye û bi egerê vê çendê jî hevrikiyeka berdewam di nav bera herdu dest helat deran de peyde di bo vêjî dexiwaz kerên nu kirinê yên rojava pal ve den vê hevrikiyê û nîşanên wê dest nîşan bi kin bi riya hevberkirinê di nav bera dewletê bi têgeha kilasîk û dewletê bi têgeha nû, her wesa mifa wergirtin ji hevrikiya olî ya kevin di nav bera Kasolîk û Pirutistantan de û ronkirina çareyan bi riya dest nîşan kirina zemînekê ji bo cuda kirina olî ji dewletê

û pêkanîna serxwebûna rast ya biyavê siyasî ji biyavê olî û desthelatderiya wê. Lewra pirosêsa nûkirina siyasî li rojava bi taybetmendiya hevirikiyê di navbera siyasetê û olî de û di nav bera mîrî û papay de di pêvajoya dîrokî de di hate pêş. Her wesa daxwazkirin bi rengekî aşkere bo pêtiviya azadkirina biyavê siyasî ku biyavekê giştî ye bo hemî tiwêjên civakî digel cudahiya taybetmendiyên neteweiyî û Olî ji biyavê olî ku biyavekê candarî û Olî yê taybet bi tiwêjên cuda yên civakî ve ye. Her wesa ev hevrikîye bi saxileteka dî jî diyare ew jî pirosêsa veguhastina wî ji sîstemê hizirî yê tiyorî (Aydolocî) bo sîstemê hizirî yê dî ku girêdayî ye bi babetiya zanistî û paşî pena birin berev pîverên kiriyara desthelatderiyê li ser şiyanên kiriyarî û destkeftên kartêker. Ne ku li ser jêyatiya Aydiyolocî ol li rojava nimûne ye li vêrê. her wesa em karin .palderekê dî yê rast di pişt nûkirinê de bibînin ew jî pirosêsa hilkêşana pîrûziyê ji biyavê siyasî û ewên karî tê de dikin. Ev pirosêse ku armanc jê ewe rê li siyasetvanî digiê xwe bi olî yan her tiyoreke hizirî - Lahûtî yan Aydiyolocî bi parêzê ûwî danê li ber rexnê yan dan û standinê yan berpirsyar kirinê bi piştevaniya desthelatdariya ku bi karanîna wê di hête kotirol kirin xwe ji her kiryareka zêrevaniyê yan berpirsiyar kirinê dûr dêxê. Vêce pirosêsa cudakirina biyavê siyasî ji biyavê olî çarek bû rojava gihiştiyê û bi karanî ji bo avakirinê û her wesa kiriyarên dezgeh kirinê yên xweser di nav de yên (yasadanan – raperandin - dadwerî - yasayî- ragehandin) wênene ji wênên bi cihanînê û berhemê vê hevrikiyê bû, dîsan desthelatdariya yek li ser yeka civakê rojava û guhorîna biyavê siyasî bo teknîkeka kargêrî encamekê dirustê pirosêsa nûkirinê ye ku egerê serekî yê peydebûna wê bû, belê astenga rasta niha di kevê di riya nûxiwaziya siyasî de û bi egerê berfireh bûna wê ya bi lez û mezin li vî maweyî ji dîrokê her wesa dest pêka wê ji qonaxên pêşiy yên pirosêsa belav kirina wê ji destpêka Kolonyalizmê û heta şandinên rewşenbîrî û zanistî heya di gihê dezgehên nû yên ragehandinê, ev hemû prosêsa bersîng girtinê û hevrikiyê ye digel binyatên civakî û rewşenbîrî û siyasî yên kilasîk ku xwe ne razî di kin ji têgeha rojava û ser bora wê ya nûkirinê û çûna di nav baştirîn dest û darade û digel wan bê xwe milkeçyê wan bikin bi serve serve bi kêmatî, di gel hindê jî ku piraniya welatên ne rojavai yên dîmoqrasiya rojava bo wan hatiye hinartin yan tovê wê hatiye çandin da ku werarê di gel werara civakî bikê li pey seqaiyên xwe yên civakî, van welatan dest pê kiriye û taybetmendiyên xwe yên navxweyî û ne rojavayî û hevbendiyên xwe yên navneteweyî û xweyî û herêmî didanê beramber nûxiwaziya siyasî nemaze ya rojava. Nûxiwaziya siyasî jî dûrbîniya xwe û her wesa şiyana xwe ya zêde û nermatiyeka mezin nîşadaye bo wergirtina wan taybetmendiyan bo nimûne jî em di karin nîşanên vê wergirtinê bibînin bi riya dîtina hevjiyana hey di navbera terz, dap û nerîtan digel dezgehên dîmoqrasî yên siyasî û yasayî li welatên ku em di karin sîstemên wan bi dîmoqrasiya ne rojava nav bikin bi sirûştê wan yên hizrê û cugrafî û neteweyî. Yan jî ewa em dişên nav bikin bi rêkeftina gelên wan civakan li ser pirosêsa lêvekirina biyavê

siyasî ku kiriyarên nûkirina siyasî karin kertên nû yên Dewletê bi xwe ve bigirê ji dezgehan, partiyan, sendîkan û yekîtiyan, li wî demê ku siyaseta kilasîk kertên dewleta kevin û kilasîk weku Hoz, Ol, dap û nerîtan bi xwe vedigirê.

bi hindê biyavê siyasî li dewletê dibê meydana berîkanê di navbera aqildariyeka vekirî ya belavker û werar ker û aqildariyeka parêzer, kilasîk û têkçûy û du dil, aqildariya yekê gerewê li ser hebûn û nebûna wererî û vêre gehiştina zanistî dikê û xwe bi dîtina xwe ya yekgirtî ve bo dîroka mirovan û werara wî ve girê didê, belê aqildariya diwê gerewê li ser taybetmendiya navxweyî, neteweyî û olî, dikin, her wesa girtina riya pêşveçûna biyê ji destdana taybetmendiya neteweyî û aqildariya yekê pişta xwe bi hêrîşê di armanca xwe de ber bi nehêlan û xweguncandinê û kontirol kirinê germ dikê, belê aqildariya diwê pişta xwe bi bergiriyê ji mana reseniyê û mîratê wê yê helbijartî û nerazîbûna parçeiyî germ dikê, û li wî demê nûkirin di şiyanên zarvekirinê digehê li ser berxwedanê û ber bi xiwandina wê di çê bi awayek praktîk di bizava xwede ji bo parçekirina wê û bo hejandina wî dizanin û bizavê dikin ji bo xwe guncanê digel lê belê li dûv mercên xwe.

Weku dawiyê :

Ji ewa me li serî gotî em di karin bigehine wê encamê ku her nêrîneka aqildarî û lûjîk bo cîhanê eve ku yek digehê baweriyekê ku kes li ber pêşvebirina zanist, teknolociya rojava û pêşveçûna wê rawestê.

Lewra em ne mayne bi hindê razî bin ku bi xişîmî û sawêlkatiya siyasî bihêne pesin kirin, her wesa daxwaza bergiriyê bikin ji dirêje dana rojava bo cîhanê û deverê bi taiybet her wekî miletên deverê ewên em pişikdariyê digel wan de dikin bi têkeliyeka hizrî û rewşenbîrî û olî û daxwaza hindê dikin. Nîşana vê jî ew diruşmên gelek ewên ji bo ber sînggirtina dagîrkirina rewşenbîriya rojava û cîhanîkirinê radiwestê weku wênek ji sîstemên kilasîk li rojhelata navîn ku palpiştiya xwe dikê li ser vegeronkên îhtîkarî .. sozdariyên tiyorên neteweyî û aydiyolocî ku bizavê dikin bo parastina sîstemên wê û cihên wê li desthealtdariyê bi tenê .

Her wesa bo wergirtina têgehên cîhana rojava berçav dikin bê xwendin û şirovekirina zanistî û kiriyarî bo jîwarê û dûvelankiya temam ji (Alienation)a civakî û aborî bi awayekî taybetî, da nekevine di tepika havîbûnê de destdana kesatiya me ya berçav , bi vê çendê em dişên biwêrin û bêjin serbora me ya dîmokrasî (heker ya dirust bê em bêjinê serbor)ya ber bi hêlên rêbaza zanistî diçê li dûv wê çenda dîmokrasî li cîhana nûxwaziya siyasî ya evro dibêjin ku yek ji amîretên wê ye ya ku aborekê dirust û saxlem bo civakî wekî civakê me yê kurdistanê bi cih di ênê , û di gel wê çenda dezgehên me yên siyasî ku bi (partî) dihê niwandin ku dîmokrasî li civakên pêşkeftî ji alê aborî û civakî ku cuda ye ji civakên çandinê û têkel ku berev wer-areka aborî û civakî diçin her wesa zanîna wê ku dimokrasî pêş di kevin û hemecor dibin li ser binyatê astê civakî yê civak têde û li pey her qonaxeka pêşveçûna wî.